

folklorame


Zargotin pişt e, folklor her tişt e!

Hejmara 8, | Kanûna Pêşîn • Kanûna Paşîn • Sibat 2021

Biha: 15€

Lorîyên Botanê, Lehî Bohtan
Sê niş, sê deng, sê jîyan, Occo Mahabad
Gurî û ap û amoj, Eşref Keydani
Cimîlûk, Şehriban Matyar

Serhatîya Mendikî û strana wê, Yaşar Kaplan
Rewşa folklorê li Devera Behdînanê
(Ji salên heftûyan ta nuke), Cemil Şêlazî
Qaydeyê meşkê ji Qelqelîyê, Mehmet Yildirimçakar
Merga gulokan, Xecê Bîşeng



WEQFA
MEZOPOTAMYAYÊ



SPAS JI BO ALÛKARÎYA WAN

Apo Oncu
Aydin Batur
Beroj Mukrîyanî
Bêrîtan Can Yaş
Bîlal Guldem
Bîrgun Uzûm
DÎHA
Dûrzan Cîrano
Ercan Altintaş
Eşref Bolumcu
Enwer Ozkahraman
Ferhat Arslan
Mazlûm Sîyabend
Mehmet Kubîlay
Mûrat Adiyaman
Orhan Tanhan
Selmet Guler
Serdar Canan
Tehsîn Baravî
Ugur Sermîyan
Xoşyar Pêşeng
Zozan Gûçlû
Zeynep Yaş

TÊKILÎ

folklorame@gmail.com ✉

folklorame 🐦 📷 📺 📱

Her nivîskar ji nivîsa xwe
berpîrsiyar e.

Kovara folklorê ya sê mehane

Sal: 2

Hejmar: 8

Xwedî: Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer

Berpîrsa Nivîsan: Gevrîye Atli

Edîtor: Eşref Keydanî

Redaksîyon: Evîndar Şevîn

Desteya Weşanê:

Celîlê Celîl

Bêrîvan Matyar

Elîf Gunduz

Mem Mukrîyanî

Zîya Mukrîyanî

ISSN: 2667-6443

Grafîk: Sevînç Adiyaman

Fotoyê bergê pêş: Orhan Tanhan

Fotoyê bergê paş: Apo Oncu

Navnîşan: Weqfa Mezopotamyayê

Mezopotamya Eđitim Bilim Sanat Sađluk ve Kùltùr Vakfı

İktisadi İřletmesi

Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/blok

Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır

Sertifika No: 42382

Çapxane: Aliođlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kađ. San. Tic. Ltd. řti.

Orta Mah.Fatim Rùřtù Sk. No: 1-3/A Bayrampařa-İstanbul

Tel: 0212 612 95 59

Sertifika No: 16919

Naverok

- 5 Ji edîtorî
- 6 Lorîyên Botanê, **Lehî Bohtan**
- 9 Tûsê û Mastê, **Mehpûs Serhedî**
- 14 Sê nifş, sê deng, sê jîyan, **Occo Mahabad**
- 20 Kilama Heso, **Celîlê Celîl**
- 21 So, **Ayela Zarto**
- 25 Xaçepirsa folklorê, **Oktay Altûn**
- 26 Dilê'm, **Bêrivan Matyar**
- 28 Sê hîkayetên Qereçobanê, **Evrehmanê Bello**
- 30 Lihevanînokên Colemêrgê, **Yûsif Hêşetî**
- 32 Gurî û ap û amoj, **Eşref Keydanî**
- 37 Kilorîk, **Elîf Gunduz**
- 39 Serhatîya Mendikî û strana wê, **Yaşar Kaplan**
- 44 Navên tax û mezrikên gundên Kûrecîka Meletîyê, **Mahîr Ugur**
- 47 Sê Bira, **Nûredîn Vural**
- 50 Rewşa folklorê li Devera Behdînanê (Ji salên heftîyan ta nuke), **Cemîl Şêlazî**
- 61 Qaydeyê meşkê ji Qelqelîyê, **Mehmet Yildirimçakar**
- 64 Cimîlîk, **Şehrîban Matyar**
- 66 Çîrokên biwêjan-4, **Asmîn ûyanik**
- 68 Danaşîn û nirxandina pirtûka “Mamê Rovî”yê, **Evîndar Şevîn**
- 72 Xoştevíyê Xweda, **Jîyan Ozkan**
- 76 Qurmike ra Çend Zewtî, **Surya Human**
- 80 Hin biwêjên Cizîra Botanê, **Dildar Botî**
- 84 Li Midyadê hin leqebên tên bikaranîn, **Elîf Gun**
- 88 Yew Lorika Dewanê Ma, **Şemseddînê Xalîtê Osmanê Berxoyî**
- 90 Merga gulokan, **Xecê Bîşeng**

Ji edîtorî

Gelî hezkirî û bendewarên Folklorî Me, di quncikê dilê xwe û pirtûkxaneya xwe da cihekî din jî vekin, va ye Folklorî Me bi hejmara xwe ya 8ê amade ye ku bê seredana mala we û dilê we bike. Bi vê hejmara xwe me du salên xwe tamam kirin. Bi alîkarî û handana we dê gelek hejmarên Folklorî Me bîn weşandin.

Folklorî kurdan hem kanî ye hem jî behr e. Me got, folklorî kurdan kanî ye, belê kanîyeka wisa ye ku ava wê dermanê dilan e, kilê çavan e û bêhna gulana e. Belê her wisa ye lê kanîyeka bêxwedî ye, û ava wê bi çol û çolistanan da diheriqe. Yan jî xelkê berê ava kanîya me daye ser zevî û baxçeyê xwe. Ligel ku kanî ye, behr e jî folklorî me. Behreka wisa ye ku tê da mirarî û durên ku têra xezîneyan dikin hene. Heyf ku xelkê dest danîye ser behra me jî. Cîranên bêbext û netî, îro roj kanîya me kirine ya xwe. Nankor û devşekalên xwe jî berdane binê behra me ku gencîneyên me derînin û li ser navên xwe qeyd bikin. Gelî kurdino, gelî camêr û canikan, îro roja xîret û xîretkêşan, roja kar û karkerên kurdî û kurdîtîyê ye. De rabin mil bidin milê me, da ku folklorî me li nav dest û pêyan neçe. Qîmeta kal û pîran bizanin, ji tenîştê dê û dapîran ranebîn, guh bidin wan û gotinên wan yên zîvîn û zêrîn qeyd bikin û binivîsîn. Çawa ku Xanî dibêje, *“da xelk nebêjîtin ko ekrad bêmerîfet in, bêesl û bunyad.”*

Dîsa naverokeka têr û tijî me amade kir ji bo we hêjayan. We bivê xwarin, herin li nivîsên *“Cimîlîk”, “Kilorîk”* û *“Merga Gulokan”*ê binêrin da ku tehma devê we xweş û beşera rûyê we geş bibe. We bivê zarokên we razên, guh bidin *“Lorîyên Botanê”* ku hinde xweş e ekla wan. We bivê zarokên we bikenin, xeberoşka *“Tûsê û Mastê”* yê ji wan ra bixwînin lê dîqet bikin ku bila ji kenî bi xwe da nemîzin. We bivê ku hûn şîretan bigirin yan jî şîretan li hinan bikin nivîsên *“Xoştevîyê Xweda”* û *“Sê hîkayetên Qereçobanê”* bixwînin û da bizanin em ketine kîjan zamanî. Heke hûn folklorîsteka/î meraqdar bin û daxwaza we hînbûna xebatên heyî be ji kerema xwe nivîsa Cemîl Şêlazîyî bixwînin ku wî taybet ev nivîs ji bo kovara me transkirîbe kirîye. Dê gelek sûdewar be ji bo we. Kurtebîbloyografyaya xebatên folklorîk e li Devera Behdînanê. Ku hûn aciz bin ji xwendina çîrok û hîkayet û gotaran berê xwe bidin *“Xaçepirsa Folklorê”* ku Oktay Altûn her hejmar ji bo we amade dike.

Dîsa di vê hejmarê da Dildar Botîyî li ser biwêjên Cizîrê nivîsek amade kirîye, Surya Humanê hin nifirên gundê xwe bi zaravayê kirmanckî qeyd kirine û nivîsîne. Yaşar Kaplanî daye dû şopa strana Mendikî û serhatîya wê, Elîf Gunê Midyad serûbin kirîye û ji qunc û çalan leqe-bên Midyadê dane hev. Occa Mahabadî jî mîna nêçîrvanekî war bi war şopa malbatekê gerandîye û sê lehengên vê malbatê bi me dane nas-kirin.

Delalîno, hay ji xwe û hezkirîyên xwe hebin, hay ji sihet û qewata xwe hebin. Ji xwe û milletê xwe hez bikin. Piştî ku *berfa însanan* jî barîya di bihara rengîn da li ber agirê azadîyê em dê merhebayeka din bidin we.

Eşref Keydanî



Sê nifş deng jîyan



Mihemedê Siloyê Miho



Mecîdê Silêman



Sîsa Mecîd

Mecîdê Silêman, di wan salan da bi kilamên dengbêjî û helbestên xwe yê xelkî, balê dikişîne ser xwe, ew bi qîza xwe ra -Sîsa Mecîd- ji bo tevî xebatên radyoyê bibin diçin Rewanê. Wî ji sala 1961ê heta sala 1980yî di Radyoya Rewanê da dengbêjî kirîye û kilam gotine. Îro nêzîkî sed kilamên Mecîdê Silêmanî û pêncî kilamên Sîsa Mecîdê di arşîvên radyoyê da qeydkirî ne.



So

So, di dawîya meha nîsanê û serê gulanê da serî hildide û bi ser rûyê erdê dikeve. Heta dawîya meha tîrmehê hêşîn e û mirov dikare berhev bike û bike xwarin û bixwe. Hem lûleyên wê hem jî pelên wê tev tên xwarin.

Ayela Zarto



Navê pincarê bi kurmancî “so” ye. Bi kirmanckî jê ra “lerg” tê gotin. Li gor palpiştên ku dibêjin; dibe ku maneya navê soyê “tûj” be. Heke ku navê pincara soyê di wateya tûjbûnê da be, dibe ku jî tûjbûna ava pincarê bixwe hatibe.

Kilorîk

Kilorîk xwarineka kurdan e û li Herêma Pasûrê her demsal tê çêkirin. Pasûrî her tim vê xwarinê çêdikin. Hem ji malîyan ra hem ji mîvanan ra çêdikin.

Elîf Gunduz ▶



Ji bo kilorîkan

- Ar: Nîv kîlo
- Av: 2 qedeh û nîv (qedeha mezin)
- Şîr: 2 qedeh û nîv (qedeha mezin)
- Mast: 4 kevçiyê xwarinê
- Hêk: 6 heb
- Hevîrtirş: Nîv kevçiyê xwarinê
- Xwê: Nîv kevçiyê xwarinê

Serhatiya Mendikî û strana wê

Yaşar Kaplan

Şevên payîzê gelek sar û dirêj in. Heke xew bi çavên Mendikî bikeve êdî nikarin wî hişyar bikin. Divê wî her hişyar bihêlin. Gundî li ser hişyarihêlana Mendikî dihizirin û dawîyê rêyekê peyda dikin. Dê li ber wî gîrê Mendikî tê da ketî agirekî mezin hil bikin û heta serê sibehê dîlanê bigirin û stranan bibêjin. Belê hindî Mendikî di wî halî da, stran û dîlan ji dilê kesî nayê. Xecê bi dilekî sotî û bi çavên tijî rondik radibe li ser pîyan, stranekê diavêje ser Mendikî û dest bi dîlanê dike.



Gundê Şaranê-Qapazanê



Gundê Kelanê-Çelanê

Navê tax û mezrikên gundên Kûrecîka Meletîyê

Mahîr Ugur



Kûracîk herêmeke Meletîyê ye. Li gor arşîvên devletê, berê di ser sihî ra gundê xwe hebûne, lê ji wan hinek niha giredayî vê hêremê nîn in.

Dewletê ew gund bi cihêkî din ve girêdane da ku wan ji hev qut bike. Ev gund hemû ji eşîra reşîyê ne û zaravayê wan jî kurmancî ye. Kûrecîkî zêdetir kurdên ehlî heq in, lê li hinek gundan kurdên sunî jî hene. Dîsa di nava hinek gundan da, bi esilê xwe ermen jî hene, lê ew xwe ji kurdên ehlî heq dihesibînin. Kûracîk, girêdayî navçeya Argahê (Arxa) ye.

Li gor kal û pîran, Kûracîkî ji Xoresan û Dêrsimê hatine. Gundên Kûracîkê hemû di nava çîyan da ne, ji bo ku xwe ji şeran biparêzin ketina nava çîyan. Dema Osmanîyan û Komara Tirkîyeyê gelek êş kişandine, gelek serhildan çêbûne, lê têkçûne.

Di salên 1960î da hinek mirovên xwe derbasî Ewropayê bûne, niha gelek mirovên xwe li vir dijîn. Gelek kesên ji vê herême salên 1970 û 1980yî, di nava çepgirên tirkan da cih girtine, lê wan gelek zirar dane ziman û çanda Kûracîkê. Bişaftin ji wan rojan heta niha berdewam dîke. Ji salên nodî û vir ve gelek kesan berê xwe daye neteweperwerîya kurdî. Niha gundên xwe zêdetir neteweperwer in. Di sîyaseta neteweperwerîyê da gelek mirovên xwe cih girtine û di vê rêyê da mirovên xwe wenda kirine. Gelek kes ketine girtîgehan û gelek kes gorbihuş bûne.

Di xebata xwe da me navên 26 gundan û gelek tax û mezrikên wan gundan nivîsîn. Me navên gundan bi tîpên mezin, yên tax û mezrikan jî bi tîpên biçûk nivîsîn. Gund û tax û mezrikên Kûracîkê ev in:

Qaydeyê meşkê ji Qelqelîyê*

Mehmet Yildirimçakar ▶

* Li herêmê, Qelqelîyê, ev cure helbesta gelêrî dema dewkîyanê tê gotin. Cureyek ji stranên kar e. Dayîk ligel şixula xwe, ji bo zarokên xwe jî aş bikin wekî lorîyan dibêjin. Li Herêma Serhedê di nava Koseyîyên Qelqelîyê da ev cure wekî “Qayde Meşkê” tê binavkirin. Bi “Ho kilê ho dewo ho meşkê” dest pê dikin. Car caran navê zarokan, navên çîya, çem û banîyên herêmê jî tên gotin.

1.

Ho kilê ho dewo ho meşkê
Ez dew dikêm dew nabe
Meşkê dikem meşk nabe
Rûn li meşkê bela be
Je'ra' me'rê kor nav be
Xêncî xêra mirya be
Xêncî xarina mezna be
Wexta Mihemed xew rabe
Tembolî¹ sêrî babe
Taştêya wîna kar nabe
Bi hevrişk³ qayîl nabe
Hêkerûn hazir nabe
Delîl halê'm çawa be
Bila canê Mihemed sax be

1 je'r: jehr, axû.

2 tembolî: tuncik, takûl.

3 hevrişk: xwarineka bi nanê tezepehtî yê kel/germ û rûnê nişk yê qijilandî tê çekirin.



Qurmike ra Çend Zewtî

Surya Human

A

Adir to ser o bivaro!
Adir û halawî to ro bivaro!
Adiro sûr can û bedenê to bi-
kotêni!
Awa sîya bigêro canê to ra!

B

Ber to rê hanêbo!
Birûsk to ro do!

C

Cind û pêrî to ro dê!

D

Doğizbaşî¹ to ro do!

E

Emrê to kilm bo!
Emrê to kol bo!

G

Gulçikê to fekê to ra bierzê!
Gulê can û bedenê to ro gunê!
Gulo û kalmê² to ro gunê!
Gulo sûr to ro guno!

Û

Ûxenîmê³ çimanê to bo!

H

Hastê to qule bê!
Her to rê nêzîro!
Hewarê to mi rê biamêni!
Hewar û gazîyê to dekotêni!
Hewê sûr û samîrî canê to ko-
têne!
Hewê şima di nêbo!
Homa heq û hesawê to ra vejû!
Homa şima bîgro!
Homa to dergîyê xo ra bierzîo!

1 doğizbaşî: Nameyê nêweşîyêk a.

2 kalme: xencere, şimşêro kilm.

3 xenîm: heram.



Hin biwêjên Cizîra Botanê

Dildar Botî 

**Ev biwêj, ji biwêjên
Herêma Botanê
hinek in. Bêhtirê
van biwêjan ji eşîra
keçan hatine ber-
hevkirin. Bi hezaran
biwêjên vê herêmê
hene, yên me nivîsîn
hinek ji wan in.**

Beqê wa devê mêr re girtî: Ev biwêj, ji bo rewşên derasayî û kêmbêne dîtîna tê gotin. Carinan jî dema ku xwestineka ne di cih da bête xwestin tê gotin.

“Ma em xwe xilas nekin ji vê deverê?”

“Bisekine, ma ne tu dibînî beqê wa devê mêr re girtî. Bila dinê asayî bibe em ê lê binêrin. Beqê wa devê mêr re girtî, tu behsa xwe dikî.”

Em ho dikin mar tê de, em ho dikin dûpişk tê de: Ev biwêj, ji bo rewş û demên nexweş û neyînî ku bi ser hev da tîna û mirov li hemberî wan bêçare dimîne, tê gotin.

“Ka em çî bikin? Em ho dikin mar tê da, em ho dikin dûpişk tê da. Em nikarin xwe bilebitînin.”

Kevîl tenik bûn: Ev biwêj, dema ku mirovek gelek aciz bibe û tehemula wê/lî li hember tiştêkî biçûk jî nemîne, tê gotin.

“Hûn bi Xudê bikin, bela xwe li wî nedin, kevilê wî gelekî tenik bûye.”

Kî zava be, ew birazava ye: Ev biwêj, ji bo kesên ku serê xwe dixin nava her karî tê gotin.



Xêz: Ercan Altıntaş

Elîf Gun ▶

Li Midyadê
hin leqebên
tên bikaranîn

Yew Lorika Dewanê Ma

**Şemseddînê Xalitê
Osmanê Berxoyî**

